

Endam û aligirên nepenî yên PDK Îranê ji bo rêzgirtin ji roja 25'ê Gelawêjê û nîrxandina 61 sal xebata pir ji serbilindî û şanaziya Partiyê di Kurdistanê de, serbarê rewşa awarte ya hêzên rejimê, li tev gund û bajarên Kurdistanê de, dest bi çalaki û piropagendeyên taybet bi vê rojê kirin. Çalaki bi awayên curbicur weke hilkirina agir li bilindahiyên, belavkirina tîrêk û nivîsên Partiyê, belavkirina wêneyên rêberên şehîd û ... hatin meşandin. Ji bo zanyariyên bêtir herin bo malpera me

# Îran Di Rêya Baykotê De

## Sipas û Pêzanîna PDK Îranê Ji Xelkê Kurdistanê



R. 2

## Deqa Axavftina Rêzdar Têmur Mistefayî Di Cejna 25'ê Gelawêjê, 61'ê Salvegera Avakirina PDK Îranê De



R. 3

## Têkiliyên Turkiyê û Îranê û Pirsgirêka Kurd



R. 5

## Jin Goriyên Şer



R. 6

## Hevpeyvîn Bi Rojnamevan û Nivîskar Seîdxan Kurîj Re



R. 7

JIN



R. 10

Biryarnameya meha borî ya Konseya Evlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ji dewleta Îranê xastibû ku xebatên zenginkirina Uraniyûma xwe bide sekinandin. 31'ê Augusta 2006'an derfeta herî dawî ya Konseya Evlekariyê ji Îranê re ye, vê carê vê ji aliyê Konseya Ewlekariyê bikeve ber baykot û dorpeçkirinan... Hisara aborî ya Îranê yê bûye yek ji mijarên rojev û giring di asta cihanê de.

Dewleta Amerikayê xwazyarê baykotên bilez li ser Îranê ye. Herweha Can Bolton, nûnerê Amerikayê di NY'ê de diyar kir ku em dikarin Rejîma Komara Îslamî a Îranê li derveyî çarçoveya Konseya Ewlekariyê de ji baykot û ceza bidin. Baykotên ku ji bo Îranê tîrêk çavniherîkirin, tehlûkekirina seneta Navîkî, berbendkirina sermayeya rayedarên Îranê û dijiwarkirina seferên wan ji bo derveyî welat.



Demjimêr 17:30'ê piştî nîvroya roja çarşem, 25'ê Gelawêjê (16.08.2006)'an, weke hemû salê salvegera avakirina PDK Îranê li binkeya Deftera Siyasî ya partiye de bi çêşeke mezin hate pêrozkirin...

Dom R. 4

## Xwekuştina Jinan Berdewam E

Roja 25'ê Gelawêja sala 1385 (16.08.2006)'an de, jinek bi navê **Sekîne Feyzulahpûr**, keça Mihemedelî û hevjinê Mehmûd Mamişî, xwedîya du zarokan, xelkê gundê Uxser ya Nexedê xwe kuşt.

Pêka gotinên malbata wê, sebaba vê kiryarê belengazî û xizani bûye.

Herweha çend rojan berî niha **Ferîde** ya 28 salî, xelkê Haciava ya Seqizê agir berda laşê xwe û di encama birin û şewitina giran canê xwe ji dest da. Sedema xweşewitandina wê hêj ne diyar e.

## Azadiya Welat Bû Rojane

Rojnameya  
**Azadiya Welat**  
roja

15.08.2006'an ji weşana xwe ya hefteyî derbasî rojanebûnê bû. Eva ji bo cara yekemîn e ku Kurdên Turkiyê dibin xwediyê rojnameyê rojane û xwerû bi

**WELAT**

Kurdî.

**Desteya Nivîskar ya Agirî** rojanebûna Azadiya Welat bi can û dil pîroz dîke û vê hewl û zehmeta xebatkarên Rojnameya Azadiya Welat bi gaveke mezin û dirokî û xizmeteke binirx ji bo karwana rojnamevaniya Kurdî dihesibîne. Em careke din ji neteweya Kurd û xebatkarên Azadiya Welat pîroz dikin û hêviya me serkewtin û bexteweriya wan e.

# Sipas Û Pêzanîn

**R**oja 25'ê Gelawêja sala 1385'ê Roji (16.08.2006)'an, 61 sal bi ser avakirina PDK Îranê de derbaz bû. Hemû salekê ji aliyê endam, aligir,

dost û xelkê Kurdistanê yê evindarê partiye rêz ji bibiranina damezirandina partiya me tê girtin û her kesek bi her awayekê ku pê çêbe, li hundirê welat bi vê boneyê şadi û keyfxweşbûna xwe dide xuyakirin. Ji ber vê sebebê ku xebata partiye bi ditingeha rejimê ve ne qanûnî ye, lewra aligirikirina bi êşkera ji partiye, gelek caran cezayê tund û giran li şûnde hebûye.

Bi neçarî xelk li gor rewşa welat, rêya jêhati ji bo nişandana şabûn û keyfxweşiya xwe peyda dikin. Çendin sal e ku eva yê bûye dab û edetek ku ciwan di şeva beriya salvegera avakirina PDK Îranê, li ser bilindiya çiyayên zal bi ser bajar û gundan de agir hil dikin. Ji bilî vê çendê tirakt û nivisarên piropagendeyî di vê derheqê de di nava bajar û gundan de bi berfirehî, belav dikin. Ev kare ji aliyekê nişana xweştevîbûn û cihwarê qahim yê partiye û ji aliyekê din ji nişaneyê hebûna tevgerê dijî rejîma desthilatdar e.

Ûsal, pêşwazikirin ji roja 25'ê Gelawêjê, salroja avakirina PDK Îranê, bi awayekî

berbiçav tevî salên berê cudahî hebû. Bi vê wateyê ku xebatkarên mandînenas yê partiya me li gor rênûmayî û bernameyên partiye, çalakiyên propagandeyî yê berfireh û binirx meşandin ku ev xebat û çalakiyane ji Bakûrê Kurdistanê bigre heta Başûrê Kurdistanê li xwe girtibûn.

Guman di vê çendê de tune ye ku di bin sîbera reş ya Komara Îslamî de, propagandeyî ji bo tevgerê û rêberiya wê bizavê qedexeyê û ber lê tê girtin. Serbarê vî halî jî endam, aligir û dostên partiya me bê tirs ji gef û hereşeyên karbidestên rejimê, ji bo pirozkirina bibiranina avakirina PDK Îranê, nirxandin ji bo xebata 61 saliya partiye di wê rojê de, çeleng û netirsane erk û wezîfa xwe ya neteweyî bi cî gehandin. Rejîma kul li dil ku serbarê hemû hewl û tekoşinekê nekarîbû ber li pêla şadi û keyfxweşiya gel di vê derheqê de bigire, korane li bajarên Kurdistanê dehan kes ji ciwanên Kurd girtine û bi girtixaneyên reşçal yê xwe şandine.

Deftera Siyasi ya PDK Îranê, di pêşde tevî xuyakirina kul û kesera xwe, ji binçavkirina van ciwanan, bi xurtî vî karê rejimê mehkûm û protesto dike. Her di vê demê de wezîfa ser milê xwe dizane ku bi



can û dil spas û pêzanina xwe derheq wan kesane ku di vê boneya pîroz de çelengane xebat kirine, dide nişandan. Destê mandî yê wan bi germî bigivîşe û di heman demê de hêviya serkevtina yekcarî ji bo wan û ji bo gelê mafxwaz yê Kurd bixwaz.

Her di vê hinceta pîroz de Partiya Demokrat peymanê nû dike ku bi hemû şîyan û karîna xwe ji bo bidestveanina armançên bilind yê gelê me demekê ji tekoşinê ne sakine û her wiha bêrawestan çelengê orta berxwedanî ji maf û azadiyên gelê Kurd be.

**Deftera Siyasi ya Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê**  
29.05.1385  
20.08.2006

## Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Tevlî Cejna 25'Gelawêjê Ya Navenda 3'ê Ya Kurdistanê Bû

**L**i gor bernameyê li pêşde diyarîkiri ji aliyê Navenda 3'ê ya Kurdistanê ve, roja inê, 27.05.1385(18.08.2006)'an, birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî tevî birêz Mihemednezîf Qadirî, endamê Deftera Siyasi û birêzan Kawe Behramî û Luqaman


Mêhrfer, endamên Komîteya Navendi ya PDK Îranê, seredana Navenda 3'ê ya Kurdistanê kirin û beşdarê rê û resma pirozkirina 25'ê Gelawêjê ya navenda han bûn.

Di destpêka rê û resmê ku bi boneya 25'ê Gelawêjê û 61'emîn salvegera avakirina PDK Îranê de hatibû lidarxistin, birêz Mihemedsalih Qadirî, endamê Komîteya Navendi û berpîrsê Navenda 3'ê ya Kurdistanê bixêrhatina birêz Hicrî û hevreyên wî kir.

Piştî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, li ser zirûfa avakirina PDK Îranê û destkevtên dirokî û cihwarên xebata siyasi ya wê partiya tekoşer di tevgera azadixwaziya gelê Kurd de, axivî û rol û bandora rêberên leheng ên partiya me, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkandî, û hemû şehidên Kurdistanê û berdewbûna xortên xebatkar ên Kurd li vê partiye de dahûrand.

Birêz Hicrî, di aliyekê din ya axavtinên xwe de bal kişande ser serhildana bajarên Kurdistanê Îranê di sala borî de û xebata bêrawestan a gelê Kurd li hember rejîma terorîst a Komara Îslamî li 17'emîn salvegera şehidkirina rêberê mezin Dr. Qasimlo û hevkarî û hevxebatiya qahim û berfireh a wan tevî partiya xwe, PDK Îranê kir û hegera piştevaniya civatên xelkê Kurdistanê ji PDK Îranê, fedakarî û cangorîtiya vê partiye ji aliyekê û parastina esl û pîrensîpên demokratîk ên partiye û rêzgirtin li vî û îradeya xelkê Kurdistanê ji aliyekê din da zanin.

Her wiha birêz Hicrî, sefera xwe ya îsal ji bo derveyî welat û encamên hevdiñinê pirdestkevtên wê seredanê ji beşdaran re şîrove kir û got: "3 pîrsên bingehîn tekoşina teşkilatê li hundir welat, xebata zindî ya diplomasi û buhadan bi ragihandinê bi awayekê nûjen û pêşkevî, hegerên sereke ên wan serkevtinên partiya me ne ji bo zêdetir geşbûn û berfirehkirina tevgera azadixwaziya gelê me ku divê hemû hêz û qaweta xebatkarên partiya me bihê bikargirtin ku em bikarin nişan bidin ku em kêrhatiyê vê piştevanî û hevkarîyê ne ku gelê me tevî partiya me dike". Li dawiya axavtina xwe de kekê Mistefa,



careke din li hemû tekoşerên PDK Îranê xwest ku bi hestkirin bi berpîrsyariya zêdetir binihêrin guhertinên Siyasi û yekiti û hevrefî remza serkevtina gel da zanin.

Rê û resm bi pêşkêşkirina çend bernameyên hunerî, stran, şano û sirûdên niştîmanperwerane hatibû xemilandin.

Piştî bi dawîhatina rê û resma han birêz Sekreterê Giştî yê PDK Îranê tevî endamên Navenda 3'ê ya Kurdistanê civinek pêk ani û li ser kar û pirojeyên wan bir û ra hatin guherin û ruha hevkarîya wan bilind nîrxand û daxwaza serkevtinê ji wan re xwest.

Rêzdar Têmûr Mistefayî:

## BÎ AVAKÎRÎNA PARTIYA DEMOKRAT METODEDEK NÛ JÎ BO BÎDESTVEANÎNA MAF Û AZADIYÊN NETEWEYA ME LÎ KURDÎSTANA ÎRANÊ HAT NAVA XEBATA AZADIXWAZANE YA XELKÊ KURDÎSTANÊ

Deqa Peyama Rêzdar Têmûr Mistefayî, Endamê Deftera Siyasî Ya PDK Îranê, Di Rê Û Resma 25'ê Gelawêja 2006'an

**X**ûşk û birayên hêja!  
Mêvanên ezîz!

Bi hinceta 25'ê Gelawêja îsal, 61'emîn salvegera avakirina partiya me, PDK Îranê, ez ji aliyê Deftera Siyasî bi dil û can pirozbahiyê ji we xweştiviyan, xelkê xebatkar

yê Kurdistanê, malbatên şehidan, girtiyên siyasî, Kadro û Pêşmerge, andam û aligirên partiya me dikim û pêşerojê geş ji bo we bi hêvî dixwazim.

**Gelî birêzan!**

Her weki hûn dizanin bi avakirina Partiya Demokrat metodek nû ji bo bîdestveanîna maf û azadiyên neteweya me li Kurdistanê Îranê hat nava xebata azadixwazane ya xelkê Kurdistanê, vê partiye di yekemîn bernameya xwe de ku ji 8 madeyan pêkhatibû, bi ronî û zelalî li ser dexwaza demokrasiyê û mafê neteweyî rawesta bû, daxwaziyek ku piştî 61 salan ji vî serdemî de ne tenê xwesteka xelkê Kurdistanê, belkî daxwaza dinyaya pêşkevtî û hewcehiyêke civaka mirovahiyê ye.

Ji me hemûyan re ron û eşkere ye ku partiya me di domandina xebata azadixwazane ya xwe li dijî zordarî û ne wekheviya du rejimên Paşayeti û Komara Îslamî de ji bo gihîştin bi armancên bilind yê neteweya me ji tev awa û metodên xebatê li gor rewşê mifah wergirtiye, çî wê dema ku Komara Îslamî xebata çekdari bi ser me de sepand û em neçar bûn bi çek û tifengê parêzvaniyê ji maf û azadiyên xelkê Kurdistanê bikin û hevdem tevî vê çendê jî xortên me yê şoreşvan bi cangorîkirinê xebata siyasî meşandine, bi şahidiya dost û dujminan, xotên biemeg yê partiya me û şervanên eqîd û mêrxas, li pêşahiya xebata xelkê Kurdistanê ji bo gihîştin bi azadiyê û mafên xwe ên neteweyî bûn.

**Hevalên rêzdar!**

Di yek sala borî de, li hundir û derveyî welat bi dehan nerazibûn û xwenişandanan rêxistinên sinfî, civakî û siyasî li dijî newekheviya heyî di Komara Îslamî ya Îranê de hatin meşandin ku ya herî girîng nerazibûna xelkê Makoyê û bi xwinê gevizandina vî serhildana nerazibûnê ji aliyên hêzên Komara Îslamî, nerazibûna Mamostayên Kurdistanê di heftiya



**Wêne: Beşdarên cejna 25'ê Gelawêjê, 61'emîn salvegera avakirina PDK Îranê- Koyê**

dimeşe, nerazibûna 22'ê Pûşpera îsal, hevdehemîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li ser daxwaza PDK Îranê û xwedilêderketina xelkê Kurdistanê bi bangewaza partiye bûn bi parek ji xebata ber bi geşebûnê ya civatên xelkê.

Ev nerazibûn û berxwedaniye di halekê de dimeşin ku xelk ji serkut, girtin û îşkenceya bêrehmane û nemirovane ya kirêgirtiyên Komara Îslamî haydar in û amade ne di rêya bîdestveanîna azadiyê û mafên xwe ên neteweyî de nix û bihayê jê re bidin, lewra ye ji ku xebata gel ji bo bîdestveanîna azadiyê û mafê neteweyî di pêşerojê de dê bi bername û pan û berfirehtir bidome.

Li derveyî welat jî partiya me bi rêvebirina diplomasiyêke xurt û bihêz kari ye gelek karên girîng weki çelengkirina Kongireya Neteweyên Îrana Federal, civin di salonên "Senate" û



Rêzdar Têmûr Mistefayî

"Congreessa" Amerika û Parlemana Fransayê, civin tevî zaf binke û sazîyên bibandor li ser pirojeya siyaseta cihanî, kombûn û civînên bi çend organên dewletî ên girîng û bandorker li Amerika û Ewropayê pêk bine ku di tevahiya wan civînan de xwastek û daxwazên neteweyên Îranê û bi taybetî gelê Kurd û girîngî û rola van hêzane di guhertinên pêşerojê di Îranê de hetîye berbas.

Di warê propagandeyê de, partiya me bi avakirina malpereke internetî li Ewropayê û nemaze damezirandina televîzyona "TISHK"ê germî û guriyêke nû ye daye xebata gelê Kurdistanê ku di pêşerojê de dê bandora xuya û berbiçav hebe.

Di hevdehemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo de, endam û dostên partiye ji bo lidarxistina xwenişandaneke mezin li welatê Otrîşê û çend welatên din yê Ewropa û Amerikayê sozdariya xwe bi Dr. Qasimlo û partiya wî nişan dan.

Tevî silav û herbijin ji bo hemû xebatkarên rêya azadiyê, ez silavên taybetî ji bo xelkê şoreşvan û azadixwaz yê Kurdistanê, yar û piştevanê herdemî yê Partiya Demokrat dişinin, destxweşî û mandinebûnê ji jî endam û aligirên netir û newestiyayî yê partiya me dikim.

**Xûşk û birayên qedirgiran!**

Hemû ew pêşketinane li xebata rewya û berheq ya neteweyên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd di halekê de ye ku rajîma Komara Îslamî bi sedema siyaseta mezinxwazî û piştgirî ji girûpên tundrew yê weki Hizbelah û Hemasê û fitne û tîkderî li herêmê, bînpêkirina mafê mirovan û li rex wan jî xebat ji bo bîdestveanîna Çeka Etomî, gefa ji holê rakirina welatê Îsrailê li ser xerîtêya coxrafîyê û gelek kar û kiryarên neberpîrsane yê din, ji aliyê civaka navneteweyî yê ketiye bin zext û

givaşê û rasti kirîzekê hatiye ku heke em ne bêjin derketin ji vê kirîze mihal e, em dikarin bibêjin pir dijwar e. Ji ber bîsarbûna rejimê li ser van siyasetane û ne bersivdayîna bi daxwaza civaka navneteweyî derheq sekinandina zenginkirina Uraniyûmê, egera biryara cezadana Îranê ji aliyê Konseya Ewlekariyê, pêşdîtina pêşerojê ne diyar ji bo xelkê Îranê di bin siya vê rejîma kevneperest û serberedayî tê kirin.

Rejîma Komara Îslamî ku xwe li hember givaşa xurt ya navneteweyî de dibîne û ji aliyê din tirs ji xebata ber bi geşkirina neteweyên Îranê perîşan kiriyê û roj li pey rojê zexta xwe ji bo ser xelkê bizalhati (werezbuhi) yê Îranê zaf û zêdetir dike. Li gor serhejmariyan, Komara Îslamî ya Îranê li sala borî di cihanê de pileya duyem di idamkirina xelkê de hebûye û cinayeta herî nû ya rejimê di vê derbarê de, kuştina cihê gumanê ya Ekber Mihemedî, xwendekarê azadixwaz di girtixaneyê de bû.

Rejimê îsal tund û tûjî li dijî girtiyên siyasî zêdetir kiriyê û ezîyet û êşandina wan di zêde û xurt bûnê de ye, her di vê demê de, roj li pey roj givaşê bêtir dikeve ser rêxistinên xwendekarî, kedkarî, mamostayan û jinan û navgînên ragihandinê weke rojname û kafînetên girtin û qedexekirin yan bi tevahî yê ketine bin zêrevaniya rejimê. Konterolkirina telefona xelkê û bi taybet ew malbatên ku gumana alîkarîkirin tevî rêxistinê siyasî ji wan tê kirin, bi awayê herî tund dimeşe.

#### Gelî rêzdaran!

Li gor vê rewşa nû ku min qala vê kir û bi baldan bi vê rastiyê ku partiya me hem di nava kom û komeleyên siyasî yên cihanî, Îranî û Kurdistanî de xwediyê hitbareke taybet û hem di nava xelkê Kurdistanê de jî xweştevî û nîfûzeke berbiçav heye, bêguman dikare li guhertinê pêşerojê di Îranê de roleke gelek baş derheq rijdkirina xebata hundir û hevixistina opozisyonê de bilîze. Merca bingehîn ya cîbecîkirina van wezîfeyên girîng, mifahwergirtin ji hemû potansiyelan ji bo bizvandina civatên xelkê Kurdistanê û komkirin û birêxistina wan di refa xebatkarên demokrat de ye.

Em dizanin, iro medya roleke baş di hişyarkirin û jordebirina zanariyên civatên xelkê de dilîze, lewra divêt em ji dezgehên piropagendeyê ên xwe ji bo şermazariya bînpêkirina maf û azadiyên xelkê ji aliyê rejimê ve demekê ji derengiyê nekin û her di vê demê de rêya berxwedanî û xwestin û baskirina maf û daxwaziyan nîşanî wan bidin.

Diplomasiyê di gehandina daxwaziyan xelkê bi civaka navneteweyî bandoreke mezin û jêhatî di pêşdebirina xebata gel ji bo azadî û serbestiyê de dilîze, lewra divêt em giringiyê bêtir bi karê diplomasiyê bidin.

Birêvebirina ev erkên jor û karkirina mîcid di vê derbarê de rewş û delîveya hilwaşandina rejimê amadêtir dike û xelkê ji belaya hebûna Komara Îslamî serbest dike. Di vê roja dirokî de em careke din peyama hevxeberiyê ji bo neteweyên bindest yê Îranê û giştî azadixwazên Îranê di pêxema hilwaşandina Komara Îslamî ya Îranê û avakirina hikûmeteke demokratîk ya Federalî de dişînin.

**Bi hêviya wê rojê, careke din cejna we pîroz be.**

## Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

### Amadekar: Nûredîn Sofizade

15.08.1906'an, fermana meşrûtiyê ji aliyê Mizeferedîn Şahê Qacar di Îranê de.

15.08.1979'an, şehîdkirina 21 kesên ji xelkê bajarê Seqîzê ji aliyê hêzên Komara Îslamî ya Îranê.

16.08.1945'an, avakirina PDK Îranê. Herwiha di vê rojê de û di sala 1941'an Komeleya Vejiyana Kurd, (J-K) hate avakirin.

16.08.1953'an, pêkhatina civîneke giştî û berfireh ji aliyê xelkê bajarê Mehabadê bi organizîkirina PDK Îranê ji bo piştevanî ji wêdebirina şahê Îranê ku revibû Bexdayê.

16.08.1987'an, di salvegera avakirina PDK Îranê de, hêzên rejîma Komara Îslamî ya Îranê gelek bi tundî û bi dirêjahiya şev û rojekê binkeya Deftera Siyasî ya vê partiyê dane ber êrişê top û çekên giran, heya bombeyên kimyayî ji bikar anî.

16.08.1995'an, birêveçûna cejna mezin ya Yobila Zêrin ya PDK Îranê an ku 50 hemî salvegera avakirina vê partiyê.

17.08.1984'an, di vê rojê de hêzên rejîma Komara Îslamî ya Îranê di êrişê pan û berfireh bi ser bajarên Rebet, Mehabad, Pîranşar û Nexedê de, berbirûyê berengariya Pêşmergeyan bûn û hêzên dijmin rasti tîkçûnê hatin.

18.08.1924'an, weşana yekemîn hejmara rojnameya "Jiyanewe" li bajarê Silêmaniyê.

19.08.1979'an, di vê rojê de Xumeynî Fetwaya Cihadê li dijî gelê Kurd li Kurdistanê Îranê da. Di encama vê biryarê de hezaran kes bûne gorî û şerê berengariya gelê Kurd li hember vê rejimê dest pê kir ku heya niha jî her didome.

19.08.1953'an, di vê rojê de li dijî hikûmeta Neteweyî ya Dr. Musedîq kudetaya leşkerî hate kirin û ev hikûmeta ji nav çû û careke din desthilata diktatoriyê per û baskên xwe bi ser welat de kişand.

19.08.1953'an, Eli Qazî, Kurê Pêşewa Qazî Mihemed, bona nişandana poşmaniye ji derbazbûyîya malbata xwe çû bal şahê Îranê û daxwaza lîxweşbûn û lîborînê ji Şah kir.

20.08.1924'an, bo yekem car hêzên Bîrîtaniyayê bajarê Silêmaniyê dagir kirin û dawî bi temenê desthilatdariya hikûmeta Padîşahiya Kurdistanê hat.

21.08.1920'an, serhildana Bîrahîmxanê Delo li bajarê Kîrîyê li dijî hêzên Bîrîtaniyayê.

21.08.2006'an, di vê rojê de Sedam Husên, Serok Komarê berê yê Îraqê û Eli Kimyayî ji çend kesên din ji desthilatdarên berê yê hikûmeta ji nav çuyî ya Beesê bi sûca cinayetên weke Enfal li ser gelê Kurd li Kurdistanê Îraqê li Bexdayê hatin mehkemekirin.

22.08.1942'an, li welatê Vîyetnamê di navbera nejadperestan û azadixwazan de şer derket holê û bû sebebê pêkhatina bizava "Hoşimîn" ji bo piştgirîkirin ji xwestekên azadixwazan.

23.08.1514'an, bi dawî hatina şerê Çaldîranê û parçebûna axa Kurdistanê di navbera Osmanî û Sefewîyan de.

25.08.1941'an, hêzên Sovîyet û Bîrîtaniya ku vê demê hevalbendên hev bûn, û piştî hêzên Amerîkayê ji hatin nava axa Îranê û bi vê egerê hikûmeta Rezaxan nekarî xwe bigre û sernixûn bû.

30.08.2005'an, zanayê navdar û mezin yê Kurdan, Mamosta Mela Ebdilkerîm Muderîsî koça dawî kir. Ew kesayetiyeke mezin yê Kurd di warê dirokî, çandî, olî bû û gelek xizmetên mezin bi mîletê xwe kir.

**Doma Rûpela 1:** Bi beşdarbûna Sekreterê Giştî, endamên Politbüroyê a rêberayeti û hijmarek zaf li kadro, pêşmerge û malbatên wan û her wiha hin mêvanên din, bi sirûde niştîmani ya "Ey Reqîb" û parastina deqeyekê bédengiyê ji bo bibiranina şehîdên rêya azadiyê, rê û resm dest pê bû.

Di aliyan din ê rê û resmê de ev babetane hatin pêşkêşkirin:

- sirûda "Bijî Dêmkokrat" - korsa YJDK Îranê û kora hunerî.

- Helbesta "Gulî hiwa" - Mamosta Bêbeş.

- Peyama YJDK Îran - Xatûna Sikala Hekîmzade.

- Govenda girûpa Mukirîyan.

- Peyama YCDK Îran- birêz Mensûr Semar.

- Peyama YXDK Îranê- birêz Kerîm Perwîzî.

- Govenda girûpa Kurdistan.

- Stran ji aliyê du kečan bi navên "Estêre" û "Beyan" ê.

- Nimayîşa Karatayê - çend kes ji Pêşmergeyên Navenda 1'ê ya Kurdistanê.

Hêjayî gotinê ye ku bi şahî û xweşî di nava gerên govendê de rê û resm bi dawî hat.

**D**u welatên  
Turkiye û  
Îranê di warê  
coxrafiyayê ve

ciran û li rex hev, lê di  
warê ideoloji û  
berjewendiyên  
desthilatdarên dewletî  
di wan du welatane  
de ji hev dûr in. Her  
wiha ev du welate  
pêşneyeke dûr û dirêj  
ya alikarî û  
gengeşeyan bi hev re  
hene.

Piştî Şoreşa Gelên  
Îranê di sala 1979'an  
de, pêwendiyên

Turkiyê tevî Îranê gelek evraz û nişiv  
hebûne. Turkiye wekî dewleteke Sekolar û  
Komara Îslamî ya Îranê weke rejimeke  
ideolojîkî, kevneperest û paşverû bi kêmi bi  
hev re tebahî hebûne. Turkiye di peyman  
Etlanitika Bakûr, wate NATO de endam e,  
pêwendiyên leşkerî ji bi Dewletên Yekbûyî  
yên Amerika û Îsraîlê ji heye. Lewra ji  
hemû ciheke din ji aliyê desthilatdarên  
Komara Îslamî a Îranê dikeve ber rexne,  
gazinde û nerazibûna vî welatî. Vê çendê  
wisan kiriyê ku gelek tîkiliyên aborî,  
diplomasi û ewlekariyê yên di navbera wan  
du welatane sarî û qelsiyê bi xwe ve  
bibinin. Li hemebr de demeke dirêj dewleta  
Turkiyê li ser wê guman û şikê bû ku Îran di  
kar û barên hundirê Turkiyê destêwerdanê  
dike û piştgiriyê ji girûpên tundrew û  
radikal yên Îslamî li Turkiyê dike. Hinek  
caran dijminayetiyeke aşkira di tîkiliyên  
van du welatên giring yên Rojhilata Navin  
ku derwazeyê Ewropa û Asiyayê pêk tinin,  
hatiye ditin. Bi sedema hebûna kirizên  
mezîn û berçav yên aborî û siyasî di vî  
welatî de û birêvebirina bernamêyên aborî  
û siyasî yên xwe, li hember Îranê de hinek  
caran nermiyeke bêtir ji xwe daye  
xuyakirin.

Bi awayekî giştî hin guhertinên rêzokî di  
tîkiliyên tîji evraz û nişiv yên Îranê û  
Turkiyê de di dema Şerê Sar û piştî bi dawî  
bûna şerê han, bandor hebûn ku li vir em  
bi kurt, kinî û formolekiri basa wan dikin.

1. Dawîhatina şerê Îranê û Îraqê, di  
dema wî şerî de Turkiyê gelek mifah ji  
kîrîza han wergirt û her du welatan bi  
sedema înzwaya navneteweyî neçar bûn ji  
Turkiyê wekî rêya anîna alav û hewcehiyên  
din yên xwe mifahê bistinin.

2. Şerê Kendavê, di encama wî şerî û  
çend sedemên din de, Hikûmeta Herêma  
Kurdistanê li Îraqê hate avakirin ku tirs û  
nigeraniyeke zaf ji bo wan du welatan pêk  
anî û ew ji bi xwe ketin.

3. Rikeberiya nû ya Turkiyê û Îranê ji  
bo pêşdebirina nîfûza xwe li herêmên  
Asiyaya Navîn û Qefqazayê.

4. Bandora tîkiliyên Turkiyê bi Îsraîlê  
re.

5. Pirsgirêka Kurd, bi sedema ne

# Têkiliyên Turkiyê û Îranê û Pirsgirêka Kurd

Azad Kurdî



çareserkirina demokratîk û şaristani yê  
bûye astengeke mezin ya van welatane.

6. Pirsxa Îslamxwaziyê li Turkiyê, di vê  
derheqê de dewleta Turkiyê guman û  
rexneyên xurt ji Komara Îslamî derheq  
piştgirî ji hêzên tundrew û radikal yên  
hundirê Turkiyê di warê malî û menewî de  
girtîye.

7. Guhertinên siyasî di hundirê Turkiyê  
û Îranê de, li Îranê bi sedema  
bidestvegirtina desthilatê ji aliyê  
Reformxwazan û li Turkiyê bi sedema  
serkevîna Partiya Îslamî ya Refahê, ji bo  
heyamekê guhertinên kûr û mezîn di  
tîkiliyên her du welatan de bi pêk hatin.

8. Rola hêla nift (Petrol) û gazê.

9. Piştî bûyera 11'ê Septembara  
2001'an, serbarê mehkûmkirina vê bûyerê  
ji aliyê her du welatên Îranê û Turkiyê, me  
dît ku Turkiye kete eniya diji teror û  
hevalbendiyê Amerika û Rojava, lê rejima  
Îslamî ya Îranê bi xwe sebebê bingehîn yê  
xurtkirin û pêşdebirina terorîzmê di herêmê  
û cihanê de bûye.

Baskirin û hûrbûn li ser her yek ji van  
sedemên jor ku rasterast bandor li ser  
tîkiliyên van du welatane hebûye, dem û  
delîveyeke zaf dixwaze û di çarçoveya vê  
gotarê de cih nake. Lê di vê navberê de  
eva ku giring û armanca vê nivîsarê ye,  
baskirin û şirovekirina helwesta van du  
welatane li hember pirsgirêka Kurd e ku  
heyamek e em şahidê hevgerîna û helwesta  
hevbeş ya van du welatane di vê derheqê  
de bûn.

Yek ji armancên şerê Kendavê,  
azadbûna Kurdistanê Îraqê bû, neteweya  
Kurd di vê parçeyê Kurdistanê de karî bi  
beşek ji maf û azadiyên xwe bigihîje. Lewra  
ji wê demê hetanî niha welatên Turkiye,  
Îran û Sûriya berdeham hewl û cehd kirine  
ku her yek ji wan bi awayekê pêşgiriyê ji  
berbipêşdeçûna prosesa azadiya vê para  
azadkîrî a Kurdistanê bikin. Dijberikirin tevî  
pirsa Kurd armanca kar û berjewendiyên  
hevpar û xala giring ya hewl û cehada wan  
sê welatane û nemezê Turkiyê û Îranê pêk  
tinin. Ji dehsalên 90'ê ya Zayinî şûnde ku  
Hikûmeta Herêma Kurdistanê hate avakirin,

her dema ku Kurdan  
xwestibin gawekê  
berbi pêş bavêjin ku  
cih pêyê Kurdan li  
Îraqê xurt û bihêz  
bikin, di cî de ev  
welatane bi hev re  
civina awarte lidar  
dixin û helwesteke  
hevbeş li diji dewleta  
Herêma Kurdistanê  
Îraqê û her wiha  
bernamerêji ji bo  
serkut û derbelêdayîn  
ji tevgera gelê Kurd li  
Partiyên din yên  
Kurdistanê girtine.  
Tirs û nigeraniya

welatên Îranê û Turkiyê ji vê çendê çavkanî  
digire ku çetîrbûna rewşa Hikûmeta  
Herêma Kurdistanê Îraqê û cihgirbûna  
tenahî û aramiya siyasî arîkar be ji bo  
xurtkirina seha neteweyî ya Kurdan di wan  
welatane de ku ew desthilatdariya ne  
demokratîk tê de rêve dibin.

Du welatên Turkiyê û Îranê ji bilî vî vîc û  
berjewendiyên aborî û bazirganî, bi  
awayekî berfireh ji bo berengarkirin û  
têkşikandina xebat û çalakiyên tevgera  
neteweyî ya Kurd di wan welatan de ku ji  
bo bidestveanina maf û azadiyên neteweya  
Kurd dixebitin, berdeham û bêrawestan û  
bi armanca parastina berjewendiyên  
hevbeş yên neteweyî, tenahî û sinorî bi hev  
re li hev dikin û Komîsyona hevpar ya  
ewlekari û alikariyê ji bo zêrevanîkirina  
tixûban pêk tinin.

Yek ji pirsgerêkên mezin yên Turkiye û  
Îranê di heyamê çend salên borî de, rexne  
û gazindeyên tund yên Turkiyê ji dewleta  
Îranê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê  
derheq mifahwergirtina hêzên PKK ji axa  
Îranê û Îraqê li diji Turkiyeyê ye. Lê di  
dema çend rojên derbasbûyî de hêzên wan  
du welatane biryara hevbeş bo ser  
binkeyên PKK li Kurdistanê Îraqê dan.

Yek ji sedemên komploya êrişaya hevbeş  
ya welatên Turkiye û Îranê bo ser Herêma  
Kurdistanê Îraqê, tîkdan û tevlihevîkirina  
rewşa aramî û tenahiye di vê herêmê de  
ye, çunkî rewşa Kurdistanê Îraqê li gor  
herêmên din yên Îraqê, biewlê û aramtir e.  
Heta bi vî awayî ji aliyê kê berahiya  
berbipêşdeçûna doza Kurd li Îraqê bigirin û  
rêyê nadin ku baştirbûna rewşa Kurd li  
Îraqê bandoreke bêtir li ser Kurdên  
parçeyên din yên Kurdistanê ku ew  
welatane di wan desthilatdariyê dikin, hebe  
û ji aliyê din raya giştî ya xelkê wan  
welatan ber bi alozi pêkanîmê bi rêyêke ne  
rast de bibin. Dirokê selimandiye ku cehd û  
xebata van welatane ji bo pêşgirî ji  
berbipêşdeçûna pirsxa Kurd li derveyî  
tixûbên xwe bûye. Ev kiryarane di cihana  
îro de û di bîr û raya giştî û qanûnên  
navneteweyî de bêcih in û divêt  
çareseriyêke jêhatî ji bo çareserkirina  
pirsgirêka Kurd peyda bikin.

# Jin Gorîyên Şer

**Mohsin Malcû**  
**Werger: Meryem Hacîpûr**

**20** salên dawîya sedsala 20'an û çend salên destpêka sedsala 21'an, ji salên herî bixwîn yê dirûka

mirovahiyê bûye. Niha ji zêdetir di 30 welatên cihanê de yan şer heye yan şer digihîje dawîyê. 80 heya 90 ji sedê ya gorîyên van şerane kesên sivil pêk tinin ku piraniya wan jin û zarok in.

Jinan bi awayên cur bi cur di van şeran de par hene û rolê dilîzin, hejmareke pir kêr ji wan weke siyasêvan di astê bilind û biryarder de li ser destpêkirin û bi dawî anîna şer biryaran didin. Hejmareke zaf ji wan bi

terzên cur bi cur weke leşker, kedkar yan endazyar di karxaneyên pişeyên leşkerî, nojdarî yan kar û barên qada piştî şer, tedarîk, patin, dermankirina birîndaran di şer de pişikdar in. Lê hejmareke zaf ji jinan jî bi terzêke nexweş û xembar li van şerane de û di pileya gorîyên van şerane de şirik in.

Giringtir ji niqûrên cendekî di şeran de ku kuştina mirovan û tevlihevkirina jîngehê pêk tîne, niqûrên psikolojî û civakî ne ku heya nîfşên pêşerojê de her bimîne. Di civakên ku herdem tê de şer hebûye, tund û tûjî di vê civakê de cihê xwe digre û di şûn da tund û tûjî ji rêya van pêwendiyên bav serdestane û yasayên piştgir ji van pêwendiyane, çarçove û jiyana civakî ya takekesî, malbatî ya jinan rastî hin tund û tûjîyên cur bi cur yê din dike. Îrne Xan Sekretera Giştî ya Rêxistina Efüya Navneteweyî ku yekem jina xwedî berpirsîyara Asyayî di Rêxistina mafê mirovan de ye, di konferansekê

rojnamevaniyê de li Londonê gotibû: Arteşên serdest ne tenê xenîmet girtina jinan bi heq û helal dizanin, belkî tecawizê weke alaveke şer bi kar tinin. Herweha we gotibû ku serhejmariya tund û tûjîyê di jinan di welatên li halê şer li wan 10 salên dawî de gelek hovane û bixof e. Bo minak



di "Siyera Leon" de 50 ji sedê ya jinan, li Rowandayê de nêzik bi nîv mîlyon kes, li Kongoyê de li heyamê şer de 5 hezar jin, li Bosnyayê de 20 heya 50 hezar kes û li Îraqê de ji nêzik bi 400 jinan re êriş û tecawiza zayendî hatiye kirin. Ji bilî tecawizên zayendî, gelek ji wan jin û keçane dibine gorîyên bandên mafîyayî yê çaxaxa keç û jinan û jî bo karên seksê û mifaha xirab ji wan werdigirin yan jî heke silamet bin, endamên laşê wan bi nîrxên buhadar difiroşin.

Jin herdem aştixwaz bûne û neyar û dijberên sereke yê şer in, her wekî gelek ji tevger û bizavên jî bo aştî û jîngehê ji aliyê jinan ve tîr birêve birin û organizekirin, jin jî şer vêzar in, çunku şer pir tiştên ku jêre hez dikin weke jîngeh, hevjin, zarok û malbatê wan, cihê kar û... ji wan distîne. Şer bi jîngeha jiyana nîfşên pêşerojê zirarê digihîne, daristan û li dû re heywan û... ji nav diçin, av paqîjîya xwe ji dest didin, madeyê neteqayî weke mayînan di erdî de

bicîh dimînin, pîrsgirêkek ku piştî borîna çendî salan ji şerê Îran û Îraqê, hêj dibe sedema qetbûna dest û pê, endamên laşê wan û nemaze mirîna hevvelatîyan. Bombabarkirina bajarên dibe sedema xirabûna karxane, idare û dezgehên ev pîrsgirêke dibe sedema bêşolî û betaliyê û jin weke yekemî gorîyên şer jî yekemî girûpên li ser kar derxistîyan in û eva hêceta herî baş jî bo welatên mêr serdest e ku bi mihana parêzvanîkirin jî şerê û namûsa jinan jî bazara kar derbixin û erka van maldarî û xwedîkirina zarokan bizanin, jî aliyeke din, şer dibe sedema vê yekê ku hejmareke zaf ji jinan mêrên xwe ji dest bidin ku eva jî dibe sedema zêdebûna jinên ku serperestîya malbatan li stû digrin, jî aliyeke din rewş û atmosfera şer dibe sedema pêkhatina bazara reş û jêhelcûna nîrxan û di encamê de jin ber bi aliye karên biyom û dijwar û hinek caran jî ber bi fahişetiye jî bo bijiv û debara jiyana xwe û zarokên xwe biçin, bo minak bêtir ji 300 hezar jinên xiyewanî tenê di Tehranê de hene ku pareke zaf ji wan berhema şerê Îran û Îraqê ne

Hiloşîn û herifîna cihên niştçibûna jin û zarokan, mirin û jî navcûna endamên civakê bi sedema nexweşiyên çavkanî girti jî şer û niqûrên ruhi û xemokî di encama mirîna endamên malbata wan û bêmali û derbiderî û mişxetî, tund û tûjî, qaçaxa mirovan û hemû û hemû ji wan niqûrên bîngehin in ku di şer de berçêla endamên civakê, bi taybet jinan digire.

80 ji sedê ya penaberan jin û zarok in û 85 ji sedê ya jinan di salê de qaçax dibin. Di 13 ji 17 welatên cihanê de ku zêdetir ji 100 hezar zarokên sêvî û tûşbûyî bi nexweşiya îdzê hene, welatên şer diti ne. Şer di 30 welatên de heye û hêzên aştîparêza navneteweyî tenê di 15 welatên de hene û tenê di 3 welatên Siyera Leon, Têmora Rohîlat û Kongoyê de vê hêza aştîparêzê şewirmendên jin hene.

Ev şerane ne tenê alikariyê nadin berjewendiyên mirovahiyê, belkî zexta di jin û regezperestîya zal bi ser civakan de xurttir dike û zêdetir dike û di dawiyê de jin û zarok dibine gorîyên herî mezin yê zêdexwaziyên merserdestane.

Jêder: malpera "Zanistan.com"

## Îran Di Warê Pişikdariya Jinan Di Aboriyê De Pileya 155'ê Di Cihanê De Heye

Li gor rapora geşekirina mirovî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, tenê 30 ji sedê ya jinên Îranî di çalakiyên aborî de beşdar û çeleng in. Bi vî awayî rejîma Komara Îslamî ya Îranê di vê derheqê de di nava 165 welatên cihanê de pileya 155'an heye.


Hêjayî gotinê ye ku beşdariya herî zêde ya jinan di aboriyê de vedigere ser van welatên Afrîqayî: Mozambîk 83 ji sedê, Tanzanîka 82 ji sedê û Brandî 83 ji sedê. Herwiha beşdariya herî kêr ya jinan di aboriyê de vedigere ser welatên Erebbî weke: Uman 20 ji sedê û Erebbîstana Seûdî 22 ji sedê.

Çavkanî: malpara "rassaa"

## Nigeraniya "UNICFE"ê Derheq Mifahwergirtina Nebaş Ya Zayendî Ji Zarokan

Sindoqa Zarokên Neteweyên Yekbûyî (UNICFE) nîmûneyên dawî yê mifahwergirtina nebaş ya zayendî ji zarokan bi tundî mehkûm kir û daxwaz kir ku xebateke berfireh jî bo piştgirî û parêzvanîkirin ji zarokan û perwerdehiya bêtir di warê nexweşiya "HIV"yê de bihê kirin. Li gor rapora nûçevaniya "êntixab", heyamekê berî niha jî "UNICFE"ê nigeraniya xwe li ser mifahwergirtina nebaş ji zarokan ku gelek ji wan di dibistanê de mijulê dersxwandinê ne, diyar kir.

Jêder: malpera "irwomen"



SEYÎDXAN KURIJ :

# “DENGBÊJÊN KURD, XIZMETEKE BÊ HEMPA DANE EDEBIYATA KURDÎ”

**S** EYÎDXAN KURIJ KÎ YE ?  
*Seyîdxan Kurij, di 1963'an de li Çewlîge hatiye dinyayê. Esas Muhendîsê Makînayê ye. Ji sala*

*1991'an vir ve li Duisburgê bi Kurmancî û Kirdkî weşanvaniya radyoyî dike. Ji 1992'an vir ve di rojname û kovarên Kurdî de nivîsar û roportajan dinivîsîne.*

*Ji 1997'an vir ve di nav Girûpa Xebata "VATE" de ye û ji nivîskarên Kovara "VATE"yê ye. Ji Îlona 2004'an vir ve endamê redaksiyona rojnameya "Peyama Kurd" e û berpirsiyarê beşa Kirdkî ye.*

*Heta niha 2 pirtûkên wî hatine weşandin:*

- 1- Wayê Hot birayûn
- 2- Filit û Gulîzar

**Rewşa Edebiyata Kurdî, îro beramber bi salên 80 çawa ne. Li Turkiyê ku şertên nivîsandina bi Kurdî pariyek azad bûne, çi fersend daye pêşketina edebiyatê. Gelo em dikarin bêjin ku xwendin û nivîsandin yekser dimeşin yan na..?**

**Seyîdxan Kurij:** Wekî hûn ji dizanin di diroka edebiyat û ziman û çanda Kurdî de (Mebest Bakûrê Kurdistanê) salên 80 xwediyê rolekê dirokî ne. Gava em prosesa pêşveçûna edebiyata Kurdî wek jiyana însanekê binirxînin, salên heştê, salên zaroktiya edebiyata Kurdî ne. Kurdên Bakûr di salên 80 da romanên yekemîn weşandine. Eger ez ne xelet bim romana yekemîn ya hunermend Birîndar e. Navê roman "Xanê" ye û di sala 1983'an de li Almaniya hatiye weşandin.

Piştî salên 1992-93'yan li metropolên Tirkiyê çapxaneyên Kurdî vebûn û pirtûkên Kurdî li Tirkiyê hatin weşandin. Li Tirkiyê ji berê berhemên rewşenbîrên derveyî welat hatin weşandin. Piştra hêdî hêdî li welat ji berhemên Kurdî hatin afirandin.

Ez bi giştî îro rewşa edebiyata Kurdî baş dinirxînim, lê hin sevi ye ku em dixwazin di ew seviyê da ye. Di salên heştê da yên ku bi Kurdî dinivîsand dîsa ji kêm bûn, lê îro hin li welat hin ji li derveyî welat, hejmara nivîskarên Kurd zêde bûye. Ew bi serê xwe erênî ye, lê ne bes e. Li aliyê naverokê ve, wekî me berê ji nivîsî bû, hema hema hemû nivîskarên kurd ji rêxistineke siyasî dihatin û bi perwerdeyê siyasî perwerde bibûn. Ew perwerdebûna wan a siyasî tesîr li ser berhemên wan jî kirin. Anku pirani berhemên wan salan heta yên salên 90 jî ji aliyê naverokê siyasî bûn. Ez bi xwe ewî wek negatîf nanirxînim. Li vir divê pîvan hêjayiya berhemê ya edebî be. Di edebiyata hemû dinyayê de berhemên hêja yên edebî hene. Gava nivîskar babeteke

siyasî bi zîmaneke edebî û hunerî biafirine û berhem ji aliyê estetîkê ve baş be, ew berhem dikare berhemeke hêja be. Lê dîsa ji jiyana ne yek alî ye, jiyana pîrreng e, dewlemend e. Beramberê salên 80'an, di wan salên dawî de babetên edebiyata Kurdî anagorê jiyana însanan dewlemend bûne. Êdî romanên evîne, yên psikolojîk û wd tîn nivîsandin. Ew tiştêkî erênî ye.

Bi zêdebûna nivîskarên kurd, devokên cur be cur yên zîmanê kurdî bi riya berhemên edebî derketine hôle. Ew ji jî bo dewlemendiya zîman erênîyek e. Dîsa aliyê karanîna teknîkên edebî yên cur be cur ji edebiyata Kurdî dewlementir bûye.

Bi Î.Seydo Aydoğan ve hejmara nivîskarên ciwan jî zêde bûye. Ez ewî

ji wek tiştêke erênî dibînim.

Ji ber ku berhemên bi zîmanê Kurdî zêde bûne, di nav wan de yên bêqalîte jî hene. Hin çapxaneyên Kurd hema hema her berhemê diweşînin, di nav berheman de li gor pîvanên edebî hîlbijartînekê çê nakin. Usa berhemên nebaş jî tîn weşandin, lê yên baş bimînin, yên nebaş werin birînin.

**Di dirokê de gelek çarên rewşenbîrên Kurd sedem şert û zirûfên nexweş, mecbûr mane ku koçbar bibin û herne derveyî welat. Her wiha li derveyî welat berhemên xwe amade kirine. Edebiyat di salên dijwariyê de li derve xwe parastîye. Sirgûn û xerîbî çî tesîrek daniye ser edebiyata Kurdî?**

**Seyîdxan Kurij:** Di diroka gelên bindest de nefî bûn, bi taybetî ji sirgûnbûna rewşenbîran li ser tevgera netewî de roleke berbiçav listiye. Em dikarin li vir netewa Ermenî û Cihûyan wek minak bidin. Wekî tê zanîn rewşenbîrên Kurd jî piştî cuntaya 12'ê Îlonê ya 1980'an, girseyî Kurdistan terk kirin. Piraniya ew rewşenbîran politik bûn, ango di nav rêxistineke siyasî da wek kador kar dikirin. Rewşenbîrên kurd berê xwe dan Rojhilata Navîn (Kurdîstana Rojhilat û Başûr, Lubnan û Sûriyê) ji wê jî derketin Ewropayê. Ewana li wan deran tevgerên kurd yên beşên din, kadurên siyasî yên wan beşan û rewşenbîrên wan naskirin. Rewşenbîrên bakûr piştra hatin Ewropa.

Di salên heştê de li Ewropa bi taybetî ji li Swêdê li ser edebiyat, zîman û çanda kurdî xebateke baş dest pê kir. Berê kovarên kurdî wek **Armanc, Roja Nû, Wan, Berhem, Berbang, Hêvî û Kurdistan Press** hatin weşandin. Piştra ji çapxaneyên wek **Jina Nû, Roja Nû** û yên din hatin damezrandin.

Ji ber ku hema piraniya rewşenbîrên kurd rêxistinî bûn û çapameniya kurdî jî bi destê rêxistinî siyasî dihat meşandin, piraniya ew xebata edebiyat û zîmanê jî bi destê rêxistinî siyasî dihat meşandin.

Lê wekî car cara tê kirin, red kirina her xebata ku bi destê rêxistinî siyasî tê meşandin, ne rast e. Di salên heştê de bi taybetî weşanxaneyên Jina Nû û Roja Nû û Armanc di jiyana rewşenbîriya Kurd de roleke pîr erênî listiye. Ewana bi periyodîk weşanên kurdî kirine, klasîkên kurdî weşandine, li ser rêzimana kurdî xebatên bê hempa kirine. Dîsa piraniya nivîskarên kurd cara yekemîn li vir kurdî nivîsine. Di wan kovaran de berhemên edebî jî hatine weşandin. Mirov dikare bibêje ku bîngeha edebiyata Kurdî ya modern di salên 80'an de li Ewropa hatiye avakirin. Hin kes behsa ronansa Kurd dikin. Ez ji wê baweriyê de me ku di salên 80'an de li Ewropa ronansa Kurd dest pê kiriye. Hin çarên behsa ekola Swêdê jî tê kirin. Ew dîtîne de ji rastîyek heye.

**Îro ji navenda edebiyatê xerîbî ye yan êdî edebiyat dikare li ser axa xwe şîn bibe. Nivîskarên Kurd lazime çî bikin ku edebiyat zêdetir li ser axa xwe xurt bibe?**

**Seyîdxan Kurij:** Em qebûl bikin, nekin hin ji hejmarekê mezin yên rewşenbîrên Kurd li derveyî welat in, lê başe ku piraniya çapxaneyên Kurd jî li hundirê welat in. Divê em

Hevpeyvîn: Letif Epozdemir



navbera nivîskarên diaspora û yên welat de diwaran çê nekin. Nivîskarên ku li derve ne, ew jî êdî berhemên xwe li welatê diweşînin. Êdî wek salên berê ye, nivîskarên derveyî jî diçin welat û tîn.

Cihê jiyana nivîskar ne ewqas girîng e, nivîskar bi ruhê xwe, bi hêsên xwe, bi mejiyê xwe li ku ye, ew girîng e. Gava em behsa çirok û romanê bikin, cihê qewimandina biyarê, qarektera lehengan girîng e û qalîteya berhemê girîng e.

Lê di sa jî divê em hewl bidin ku li welat nivîskarên ciwan derkevin. Ew çawa dibe? Gava me zimanê Kurdî kir zimanê xwe yê rojane, me di civînên xwe de kurdî axivîn, me kurdî xwend û kurdî nivîsand, me bi zarokên xwe re kurdî axivî, emê bikaribin gavên mezin bavêjin. Lê ew ne bes e. Heta Kurdî zimanê fermî nebe, heta Kurdî jî dibistana ewilîn heta zaningehê zimanê perwerdebûnê nebe, heta Kurdî nebe zimanê Pazarê, karê me zor e.

Ji ber wê, ji aliyê me divê hemû nivîskar, rewşenbîr û siyasethanên Kurd hewil bidin ku zimanê Kurdî di her warê de were karanîn, alikariya rojname û kovarên kurdî bikin. Ji aliyê din ve jî divê her kurd hewl bide ku zimanê Kurdî fermî bibe zimanê perwerdebûnê.

## Gava em prosesa pêşveçûna edebiyata Kurdî wek jiyana însanekê binirxînin, salên heştê, salên zaroktiya edebiyata Kurdî ne

Divê ku hin kes bêjin ew karê siyasî ye. Belê di jiyandê de her tişt bi hev re girêdayî ye. Karanin û pêşveçûna zimanê Kurdî jî parçeyekê pirsê Kurdî ye. Pirsê Kurdî jî siyasî ye. Bê di her aliyê jiyandê de li ser axa welatê karanina zimanê Kurdî, edebiyata Kurdî pêşve naçe.

**Dengbêjî, xalek gelek girîng e di edebiyatê de. Her weha edebiyata Kurdî ya devkî dengbêjiyê rûmetek bilîn hesab dike. Gelo Dengbêjên Kurd hetanî iro çî xizmet dane Edebiyatê?**

**Seyîdxan Kurij:** Ez bi xwe ji yên ku bi guhdarîkirina dengbêjan mezin bûne, ji wana yek im. Em hemû dizanin ku yên ku heta wan salên dawî zimanê Kurdî, edebiyata Kurdî parastine, dengbêj in.

Ji ber ku li Bakûrê Kurdistanê bi zimanê Kurdî nivîsandin qedexeyê bû, di destê gelê Kurd de tenê edebiyata devkî mabû. Wek hemû neteweyên dinyayê Kurdan jî kutura

xwe, diroka xwe û kelepûra xwe bi edebiyata devkî parastî ye. Dengbêjan ne tenê klam digotin, ewana kilam diafirand jî. Di kilamên dengbêjan da diroka gelê Kurd veşartî ye.

Dengbêjên Kurd xizmeteke bêhempa daye edebiyata Kurdî. Berê her tiştî edebiyata klasîka Kurdî bi dengê dengbêjan gihîştîye nişên nû. Kilamên dengbêjan jî aliyê edebiyatê ve jî dewlemend in. Hemû kilamên ku dengbêj distirên helbestên bi qalîte ne. Di wan de hunereke edebî ya kûr veşartî ye.

Helbesta modern ya nû li ser bingeha dengbêjiyê ava dibe. Tabî ku di helbesta modern de teknik û metodên rojava bi kar tên. Şîra kurdî ya netewî bê kelepûra Kurdî ya klasîk kêmbimîne.

Kilamên dengbêjên kurd dikarin ji bo afirandina çirok û romanên kurdî bingeh bin. Çimkî hemû kilamên dengbêjan bi serê xwe çirok in. Ji her kilamê dikare ew çiroka modern were afirandin. Heta hin kilam dikarin ji bo afirandina romanekê jî bibin bingeh.

**Tê gotin ku niştimanperwerî bi edebiyatê dest pê dike. Roman, berhemek pir hêja ye di edebiyatê de. Herweha, roman barkêşê gotara niştimanperweriyê ye. Edebiyat û romana Kurdî çî tesîrek li doza Kurdayetî yê kiriye?**

**Seyîdxan Kurij:** Rast e, di geşbûna ramana niştimanperweriyê de rola edebiyatê gelek girîng e. Di vî warî de pirtûka Benedict Anderson ya bi navê "Civaten Heyalî" (Imagined Communities, Reflections on the Origins and Spread of Nationalism) çavkaniyeke baş e. Anderson bi minakên gelek fireh di derketina holê ya neteweyan û ramanên niştimanperweriyê de rola edebiyatê bi taybetî jî rola romanê dinirxîne. Di nava berhemên edebiyatê de roman ya herî nû ye. Romanên herî kevn di dema modern de hatine weşandin. Ango helatina (zayîn) roman û ramanên niştimanperwerî eynî demê de ye.

Edebiyat , bi taybetî jî roman di nav Kurdan de belavbûna ramanên niştimanperweriyê roleke pir berbiçav listiye. Di destpêka dema nozdeh de berê şîr belavbûna ramanên kurdperwerî de rolekê girîng listiye. Divê li vir bi taybetî navê Ehmedê Xanî û Şêx Riza Talebanî were li ser zîmên.

Piştî şoreşa Oktobêrê di Sovyetistana kevn de romanên Kurdî yên ewilîn hatine nivîsandin. Her çiqas romanên Erebe Şemo, Qanatê Kurdo û yên din di parçeyên din de pir dereng hatine weşandin jî di sa berê li ser Kurdên Sovyetê piştra jî li ser hemû Kurdan tesîreke mezin hiştine.

Piştê li Rojhilata Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê romanên Kurdî hatine weşandin. Romana Rehim Qazî ya bi navê "Pêşmerge" ûsa li ser gelê tesîr kiriye ku piştî weşandina vê romanê navê tekoşerên Kurd bûye "Pêşmerge". Romana di nav gel de

zimanekê hevbeş û hestên hevbeş yên netewî diafirînin. Çimkî roman jî aliyê hemû endamên netewa ve tîn xwandin. Wek minak piştî romana "Pêşmerge" di nava hemû Kurdên dinyayê de tekoşerên şoreşa Kudistan wek "Pêşmerge" hatine nasandin û "Pêşmerge" wek pêyivokeke pîraz hatîye pejirandin.

Li Bakûrê Kurdistanê jî piştî salên 80'ê, romanên Kurdî di belavbûna ramanên Kurdewarî de roleke berbiçav listiye. Bi romanên Mehmet Uzun yên wek "Mirina kalîkêke Rind", "Bira Qederê", "Siya Evînê" û yên din, nişên nû di şexsiyeta Memduh Selim Beg û Celadet Bedirxan de hinê diroka xwe ya modern bûne, Kurdperwerên nişfa yekemîn (Birincî nesil Kürt miliyetçileri) nas kirine. Ew roman ne tenê ji aliyê komekê, eşîrekê, rûniştivanên herêmekê an jî endamên partiyêke siyasî, ber ku jî aliyê hemû Kurdan tîn xwandin. Bi vî awayî nava endamên netewê de hestên hevbeş, kolektîf, hafîzeyê hevbeş pêk tî. Li vir divê keda nivîskarên Kurd yên din jî neyê bir kirin.

Rola romanê ya serekî ew e ku di nav endamên netewan de alikariya pêkanîna kolektîf hafîza dike.

**Di Hişyarbûn û pêşketina milletan de rola ziman çî ye?**

**Seyîdxan Kurij:** Gava pesna neteweyan tî kirin, miheqeq behsa zimanekê hevbeş tî kirin. Hema hemû tarîfan de, divê ya filozofên dema nozdemîn de be, divê ya Stalin be, divê "Otto Buer" be, divê ya Trotskî be, di hemû tarîfan de zimanekê hevbeş rola serekî dilîze.

Zimanekê hevbeş yê nivîsî ku her endameke netewê jê fêhm bike, endamên netewê bi hev re girê dide. Di sa ziman faktoreke girîng yê identîtet e (Şexsiyet). Zimanê neteweyan jî hev cuda dike, ango bi zimanê insan dizane ku jî kîjan neteweyê ye. Ango li kîjan cografya bi kîjan insana ve jî eynî malbatê ye. Elbet neteweyên ku eynî ziman qîsê dikin, hene, lê ew rola zimanê kêmbûnê.

Rola ziman di hişyarbûn û pêşketina Kurdan de du car girîng e. Çima? Ji ber ku di netewebûnê de fakol e. Lê ola Kurdan û neteweyên serdest yek e. Her çiqas pir hatibe nivîsandin û klasîk be jî, divê mirov vê derheqê de gotina Celadet Bedirxan tu car bir neke. Celadet Bedirxan dibêje: "Du çekên girîng hene ku neteweyekê jî neteweyên din cuda dike û di nava gel de ramana niştimanperweriyê geş dike. Ji wana yek ol e û yek jî ziman e. Ji ber ku ola Kurdan û neteweyên serdest yek e, kurda ra tenê ziman dimîne"

Erê iro rojê rola zîmên girîngtir e. Çimkî li ser Kurdan zexta asimilasyonê heye. Kurd encax bi pêşvebirina zimanê xwe dikarin xwe biparêzin, bi vî awayî dikarin berhemên baş biafirînin û di qada netewî de xwe bidin qebûlkirin. Ango di nav dinyaya modern de cihê xwe bigirin. Ew



berhem dikarin, romanên baş, bin, dikarin filmên sinemayê yên baş bin.

**Pêwendiya ziman û raman, ziman û edebiyatê çî ye. Berhemên edebî, lazim e li gor zimanên xwe yan li gor kesayetiya nivîskarên xwe werin bi nav kirin?**

**Seyîdxan Kurij:** Mirov bi kîjan zimanî bifikire, dikare bi wî zimanî berhemên baş biafirîne. Her zimanek xwediyê metîqek e. Di her zimanê de ahengekî hundirîn heye. Însan bi kîjan zimanê difikire, bi kîjan zimanê xewnên xwe dibîne, bi wî zimanî va bûye yek, angû di nav dinyaya wê/i ya hundirîn û wî zimanî de ahengek heye. Însan zimanê xwe hez neke, bi zimanê xwe va aşt nebe, nikarê bi wî zimanê berhemên baş biafirîne.

Di navbera raman û zimên de pêwendiyek heye. Min li jor bersîva wê de. Lê insana dikare bi zimankê biyanî ku pişt re hîn bûye û bi vê perwerde bûye jî berhemên teorîk biafirîne. Li vir qesta min berhemên akademîk in.

Ziman û edebiyat bi rasterast bi hev ra girêdayî ne. Qalîteya berhemên edebiyatê bi karana zimanê ve girêdayî ye. Her ziman taybetmendiyên xwe heye. Pir caran gava pêkenokeke, an jî çirokeke jî bo zimanê din tê wergerandin, qet mehna xwe ya orjinal nade. Wek minak tiştêkê gava bi Kurdî tê gotin, mirov dikare jî kenan biteqê, lê gava Tirkî an jî Almanî tê gotin, qet kena insana nayê. Ziman ne tenê axaftin e. Di her zimanê de idyom hene, ahengekê dangan heye, tiştên folklorîk hene. Nivîskar zimanê xwe çiqas baş bizanibe, çiqas baş hakimî zimanê xwe be, ewqas dikare bi ziman va bilize, angû zimên baş bi kar bîne û berhemên baş biafirîne. Her insanê herî baş zimanê diya xwe dizane û jî aliyên hestê xwe bi zimanê diya xwe ve girêdayî ye. Angû her insanek herî baş dikare bi zimanê diya xwe hestên xwe bîne ziman. Edebiyat jî aliyekê xwe va ziman anina hestên nivîskar e. Berhema edebiyatê ku tê de rih nîne, ziwa ye û bê tahn e.

Pirsa navkirina nivîskaran pirsêkê kompîleks e, bersîva wê pirsê ne hêsan e. Li gor min berhema edebiyatê bi kîjan zimên hatiye nivîsandin, malê ewî zimanê ye. Angû gava berhemek bi Turkî hatiye nivîsandin, ew dibe berhema edebiyata Turkî, Kurdî were nivîsandin, dibe berhema edebiyata Kurdî. Hin nivîskarên klasîk hene ku bi eslê xwe ne Rûs in, ne Îngilîz in, lê ji ber ku bi wan zimana nivîsandine, iro wek nivîskarên Rûs, Îngilîz tînan nasandin. Lê li vir îstîsna jî hene. Di roja îroyîn de pir nivîskar hene ku li Ewropa dijîn û bi zimanên Ewropî dinivîsin, lê di sa jî gava behsa wan tê kirin, nasnasma wan ya etnîkî tê gotin. Ew jî bo nivîskarên Kurd jî ûsa ne. Ji ber ku her kesê rewya Kurdan dizane, Kurdên ku bi zimanên din dinivîsin jî wek Kurd tînan nav kirin. Lê mirov berhemên wan çiqas dikare berhemên edebiyata Kurdî bi nav bike, ew pirsgirêkeke din e. Li gor

ditîna min, mirov berhemên wan nikare wek berhemên edebiyata Kurdî bi nav bike, lê yên ku vekirî li her derê xwedî nasnameya xwe ya Kurdistanî derdikevin, ew nivîskarên Kurd in.

**Pirs û kêşeya yekîtiya alfabe û zaravên di zimanê Kurdî de gelo wê çawa çareser bibe?**

**Seyîdxan Kurij:** Hûn jî yekîtiya zimên çî fêm dikin, an jî qesta we çî ye, nizanîm. Lê iro yekîtiya zimanê Kurdî bi gelemperî ne mumkun e. Angû bi prosesekê tabîî ne mumkun e, dikare bi zorê bibe, lê ew jî di nav gel de bi cih nabe.

Çimkî di navbera zaravayên Kurmancî, Hewramî û Kirdîkî (Zazakî) de

## Divê em navbera nivîskarên dîaspora û yên welat de dîwaran çê nekin

ferqên mezin hene. Di demeke nêzik de jî wan zaravayan afirandina zimanekê ne mumkun e. Li gor min pirsgirêk ne yekîtiya zimên e. Pirsgirêk standartîze kirina yekê yekê zaravan di xwe de ye. Angû divê Kurmancî di nav xwe de, Kirdîkî di nav xwe de were standartîze kirin û zimanekê nivîsarî yê standart were afirandin. Li gor min Pirsên Kurmancî hema hatine çareser kirin. Ji sala 1985'an vir ve Enstîtuya Kurdî ya parîsê her sal bi navê civînên "Kurmancî" civînan çê dîke û encamên civînê jî diweşîne. Ew grûba enstîtû heta niha pir xebatên bi baş çekirine. Xêncî wê xebatê jî, gelek pirtûkên rêzimanê hatine nivîsandin.

Lê mixabin hin nivîsarên Kurmancî bê ku wan xebatan teqîp bikin, Kurmancî dinivîsin. Tevlihevî jî wê tê.

Pirsgirêkên Kirdîkî hene. Em çend heval jî sala 1997'an vir ve bi navê grûba xebatê ya "VATE" emî wê xebata enîstîtuya Parîsê li ser zarava Kirdîkî kar dikin. Me gelek rê girîye, lê hin jî pirsgirêk henin. Em niha hewl didin ku Kirdîkî di nav xwe de standartîze be û bibe zaraveyê nivîsarîyê.

Angû di nav her zaraveyê de devok hene, divê yekîtiya devokan pêk were. Lê niha yekîtiya zaravayan ne mumkun e û ne raste jî. Divê ûsa xebat were kirin ku her Kurd yê din fêm bike. Gava hemû zarave di radyo, televîzyon, çapamenî û civînan de werin bi kar anîn, wê gavê her Kurd di demekê nêzik de dikare zaravayên din yê Kurdî jî fêm bike. Gava me hevdu fehm kir, êdî pirs namîne.

Hebûna zaravayan dewlemendiya zimanê Kurdî ye. Ji ortê rakirina yek

zaraveyê dibe sûçek mezin. Hin zimanzan jî bo zaravayan dibênin zimanên Kurdî, ew jî ne xelet e.

Pirsgirêka alfabayên divê were çareser kirin. Lê çareser kirina wê jî ne hêsan e. Em 2 sale li Almanya bi navê "Peyama Kurd" rojnameyêke hefteyî bi zaraveyên Kurmancî, Kirdîkî û Soranî, bi alfabayên Latîni û Aramî derdixînin. Ez endamê redaksiyona giştî û berpîrsiyarê beşa Kirdîkî me.

Me hewl da Soranî bi alfabe ya latîni binivîsin, lê Kurdên ku Ewropayê ne ew hê ne, amade ne latîni bixwînin. Li Başûrê Kurdistanê kes nizane Kurdî bi latîni bixwîne. Gava alfabe were guherandin, weke Kemalîstan kir, yek şevê de hemû civat dibe analfabet.

Li gor ditîna min hikûmeta Kurdistanê dikare bi projeyêkê rêk û pêk ve di nav çend salan de alfaba Erebi biguhêre alfaba latîni. Ew dikarin niha wê di dibistanan de her heftê çend sehetan darsa latîni bidin. Xwe di hemû dibistanan de darsa Îngilîzî heye, çend sehetên latîni dikarin werin lê zêde kirin. Bi vî awayî çend salên din her kes dikare hînê alfaba latîni be.

**Xebata di warê ziman û gramêra Kurdî de bese yan na. Îro rojê zêdetir hewcehî bi çî heye? Gelo mumkun e ku di pêşerojê de ferhengê mezin ku jî hemû zarav û devokên Kurdî pêk hatiye çê be. Ji bo vî karî lazim e çî were kirin, ev wezîfeya girîng lazim e jî aliyê kê we were pêkanîn?**

**Seyîdxan Kurij:** Xebata li ser zimên tu car bes nabe. Zimanê Almanya jî zimanên herî dewlemend û kevnar e. Hûn dizanin ku pirtûkên felsefîk yên klasîk bi zimanê Almanî hatine nivîsandin. Lê di sa jî her çend salan de carek zimanê di Almanî de reform tê çekirin.

Lê li ser zaravayên Kurmancî û Soranî tenê di warê ziman û giramêrê de xebat hatiye kirin. Lê di sa jî divê di zanîngehên Kurdistanê de beşên ziman û edebiyata Kurdî akademîk li ser wê pirsgirêkê bisekinin. Çimkî iro dewleta Kurdan heye. Êdî divê xebatên li ser zimên ne wek ku heta iro hatiye bi destê kesan û sazîyên amator, berku bi destê zanîngehên Kurdistanê werin ajotin. Divê dewleta Kurdistanê jî bo xebata li ser zimanê budce biqetîne.

Lê hin pirsgirêkên Kirdîkî, Hewramî û Lorî hene. Weke min li jor nivîsî, em wek girûba xebata "VATE" li ser zaraveya Kudîkî kar dikin, lê ew ne bes e. Mixabin heta niha di zanîngehên Kurdistanê de xêncî zaravayên Kurmancî û Soranî li ser zaravayên din xebat tune. Divê zanîngehên Kurdistanê dest bavêjin wan zaravayan jî. Xebatên li ser ziman bi amatorî nabin, divê di zanîngehên Kurdistanê de beşên filolojî li ser hemû zaravayan bi awayekî micid xebatên akademîk çekin. ûsa zimanê Kurdî jî dikare di nav zimanên dinyayê de cihê xwe bigre.

# JIN

ADAR JIYAN

adarjiyan@mynet.com

**X**weza dişibe dayikeke hilberîner bidiramet(bibereket). Ew, xwe bi xwe zaye; belê her tişt ji ji wê dizê. Ji bo wê, mirov bi hêsani

dikare bibêje ku di navbera xweza û jinê de hevahengîyeke xurt û beramber heye.

Di navbera mêr û mêrîtîyê de ji lêkdan û pevçûnek tund û dijwar û lêkneker heye. Çawa bû serdest û desthilatdarên dine raselîti ser hemû xweşkiyên xwezayê bûne/dibin û hin bi hin wê ji bedewiyên wê bi dîr xistine/dixin. Mêr û mêrîtî (mêr(h)ov) ji jinê (jinê) têk dibe û wê ji xwezaya wê bi dîr dixê. Her wisa, çawa ku xweza ji hêla stembarî û desthilatdariyên dinê ve tûşî êrişen hovanê tê, jin ji bi heman awayî, tûşî êriş û çewsandinên mêrê hoveber ê ku wê bi xwe welidandîye, dibe.

Parastina xwezayê, rasterê girêdayî parastina jiyana jinê ye. Jin bi xwe jiyana e û jiyana bi jinê re vejîyaye/vedîje. Carekê jin bi hemû xwebûn siruştîya xwe, bi xwe û xwezaya xwe re li hev e. Belê mêrîtî dijmin û dijberê xwezayê û her wiha pozber û hemberê jin û jiyana ye. Jin, aştî, aramî, hevahengî û sebr û semax e. Belê mêr û mêrîtî ji dîgel/dewlet, serdestî, desthilatdarî qeyserî...û hwd e. Tcar gava ku mirov vê arîşeya mirovahiyê ya dîroki bi awayekî rastîn hilde dest, ne jina bindest hay ji vê rewşa xwe ya kambax heye û ne ji mêrê serdest zêde arasteyî xwe dibe ku bi hevkarîyeke xurt azadiya xwe û jinê pêk bîne. Ji bo wê her ku diçe gelemşebûn vê pirsqirêka jinê ji rastiya xwe bi dîr dikeve û bi hezaran sal e ku ev pirsqirêk wekî girêkeke kor di nav destê mirovahiyê de diçe û tê. Dixuye ku dê ev pirsqirêk tu carî bi hêsani neyê çareserkin.

Bêşik, her rihber parçeyekî xwezaya jindar e û li gorî şert û mercên ku tê de diji, hebûna xwe dikudîne. Wekî hemû tiştên mê, jin ji bi hemû afirînerî û behredariya xwe dayikîya mirovahiyê dike. Belê ev dayik, ligel pîrozwerî û payedariya xwe ya bêhunkûf mixabin di destê mêrîtîya serwer û hoveber de li bêqîmetî û serberjêriyê dageriyaye. Rewşa dayikê bûye rewşa mirovê/a nankor ku piştî xwarinê rabe tif binê sênika(teyfika) ku xwarin tê de xwariye, bike. Bi gelemperî iro jin û mêr herdu ji bi sinc û exlaqê mêrîtîyê hatine



rapêçandin û bi dayikîyê re xiyanetê(xayintîyê) dîkin. Ev yek, nemaze di vê serdema pêşketî û kemilî de ji bo mirovahiya îroyîn bextreşî û rûşeyîye mezin e. Her çendî ku der barê vê yekê de gelek kes û rêxistinên bi bir û biryar û hestiyar hebin ji zêde deng venade û di bin bandora feraset û karesata mêrîtîyê de diminin.

Îro jin dibe, mêr dibe, gelek kesên aqildar û ji xwe razî(!), jinê wekî berpirsiyarê vê rewşa malwêranker dibinin û dîsa bi çavê mêrîtîyê li pirsqirêka jinê dinihêrin. Tu carî hest û hizra jinê li ber çavan nagirin. Li gotin û vegotinên jinê guh nadin. Ki ser navê jinê daxivin. Heke mêr bin, jinê sûçdar û tawanbar dibinin. Heke jin bin, gazincan ji jinê dîkin û wê didarizinin. Bo nimûne, li gel ku tîgîha "namûs"ê ji hêla mêr ve derketiye holê, jin radestî vê tîgîhê dibe û tevahiya cest û hestên xwe, ji bo xatirê mêr diparêze. Tu carî jinê namûsa xwe wekî ayidê xwe nedîtiye. Ligel ku ew bi her awayî ji mêrê tolaz bi edebtir û namûstir e ji, qet di xwe de nefikirîye; berevajî wê an di bav û birayê xwe yên serdest, an mêrê xwe yê zordest an ji lawê xwe yê ku wê bi xwe ew welidandîye de fikirîye. Ango jin her gav ji serwer xwe re xizmet kirîye û bi kujerê xwe hemiliye. Heta, li şûna ku bixwaze hemcîsnê xwe(keçîkekê) her gav dixwaze dijberê xwe(lawîkekî) biwelidîne. Jixwe yê ku ew xistiye vî halî û ew perîşan kirîye/dike ji tenê ew lawê ku wê bi xwe ew aniye dinê ye.

Gotina dawî, heta ku jin azadiya xwe di ser her tiştî û nirxî re negire û jiyaneke azad û serbixwe wekî namûsa xwe nebinê û nepejirîne; her wiha heta ku mafê xwe yê jiyana bi dest nexê, ne azadiya wê û ne ji azadiya mirovên ku ew bi xwe wan diwelidîne, bi dest dikeve. Azadiya jinê bi qasî jiyana jinê girîng û çarenîn e. Û azadiya mirovahiyê ji bi qasî azadiya jinê...

Kaniya Helbestan

Letîf Epozdemir

## HÊVIYA ZELAL

her sibê bi wê hevîyê şiyar dibim  
ku dê rojên me zelal bin  
lê pir heyf û mixabin  
bayê zezebê radibin  
kulîlk ji di giryanê de şin nabin.  
Di kele kela ciwanîyê de  
Her tişt dibin derd û kûl  
Ra di pêçin hinav û dil  
Li ser textê xweşiyê rûniştine  
Keser û derd mil bi mil  
Dil dixwast ku di xortaniyê de  
Geş bibe di nava derya kenê de  
Min hew di ku êdî kal im  
Behra rûken ya dil de  
Dûr ji şahî, di xwinê de pel dide  
Bi hezaran kulîlk werbûn li ser enî  
Lê paşî tev bûne mîna ax û xwelî  
Jiyan xweş bû, lê me nedî xweşiyê  
Bi reşî me daborî kir  
Evi emr û temenî.

## DÎLBENGÎ

min bi pora rojê girt ani  
li ber derê beheştê danî  
melekan girtin bi destê Şêxê Senanî  
lê ji nav agirê dojhê deranî  
lewra ciyê dildara beheşt e  
min ew roj baş zanî  
ne ku tenîştan wan zalimên Zebanî.  
Şairên eşq û evinê  
Çeleng û jir in di babeta qelemê  
Lê piranî melûl û ziz in  
Ji destê dîrî û elemê.  
Ma Letîf ji şaire qey.  
Qiyas bi Melayê Cizirî  
Diyar e xeyalek xam e  
Ku bêje ez hempayê Herirî.  
Lê ev dinya, na  
Ne warê xweşî û rihetiye  
Do hatî îro dil bi xem diçî  
Mekanê te axa sar e hey mirî

## EZ NÊZİKÎ TE ME

ez nêzîkî te me/lê tu ji min dîrî  
bayek hênîk lê kir/yek bi yek kişiyar  
şikeftên xwe eş û keser  
kela xerîbiyê were xwarê  
ez nêzîkî te me/ji te mame bê xeber  
sitranek kevin tê bîra min  
dilê min bi min dişewite  
dikevim înkâr û îşyana  
di şevêk wiha dijwar de  
çima li ba min nînin  
xemrevîn, sitûxwar bilûra min  
kezîzer û rû bi nûra min  
ez dilê te me û tu hay ji min nîni

Nîgarkêş Barzan:

# “Nîgarkêşan Nîşandan Û Eyankirina Wêneyeke Xeyalî Ji Rastî Û Heqîqetan E”

Hevpeyvîn: Meryem Hacîpûr



**Ş**ilan, Barzan û Rêjav sê xûşk û birayên nîgarkêş û hunermend in ku li Kurdistanê Îranê, bajarê Kirmaşanê ji dayik bûne û niha rûniştîyên Kelar (Başûrê Kurdistanê)ê ne. Çend salek e ku siya bavê wan yê hunermend li ser wan nemaye û her çevnihêrê misogerbûna xewn û hêviyên azadiya Kurdistanê û vegeyriyan ji bo welatê xwe ne. Kar û xebata wan ya hunerî cihê rêz û pêzanîne ye û bala her kesekê/i bo aliyê xwe dikişîne.

Mamostayên wan 3 hunermendên ciwan û destrengîn bavê wan, Şehîd Behram Xusrewî bûye û bi xwe ji nîgarkêş û hunermendek mezin bûye ku gelek berhemên ji xwe bicih hiştine. Ew bav û mamostayê qedirgiran, herwiha hetanî dawîya jiyana xwe mijûlê perwerdekirina nûciwan û ciwanên hezker bi vê hunerê bûye. Di vê derheqê de çend zandor û korsên perwerdehiyê danîne û xelatên cur bi cur wergirtine ku yek ji wan xelatên ji aliyê “UN”ê ve bûye.

Wan sê xûşk û bira û hunermedên nîgarkêş, çend rojan berî niha bi hinceta 25'ê Gelawêjê, 61'emin salroja avakirina PDK Îranê, berhemên xwe di pêşangeheke bi navê “Şehîdan” di yek ji salonên Deftera Siyasî a Partiyê de pêkanîn ku zaf berhemên cur bi cur di xwe de cih dabûn. Lewra me ji bi derfet zanî ku çend pirsyaran raberî wan bikin:

Barzan di bersiva min de ku **ji kengê û çî demekê ve dest bi nîgarkêşanê kiriye û di vê derheqê de kê jêre hayder bûye** wiha got:

“10 sale ku me dest bi nîgarkêşanê kiriye û haydarê me yê serekî bavê me yê rehmetî, Şehîd Behram Xusrewî bû ku bi xwe ji hunermendê mezin bû. Bavê me bi evîna xwe ya mezin û fireh ku bi nîgarkêşanê hebû, em ji bi vê hunerê haydan û me ji ji şîret û ceribînen wî ji bo pêşveçûna xwe mifah wergirt.”

**Gelo heya niha we di tu zandorên perwerdehiyê de pişikdarî kiriye?**

Rêjavê got: “Her wek birayê me got, em şagirdên bavê xwe yê rehmetî bûn û ji bilî vê çendê me di tu zandor û korsên din de pişikdarî nekiriye.”

**Metoda we ya sereke di xebata hunerî de çî ye û hûn zêdetir di çî warekê de nîgaran dikişînin?**

Şilanê got: “Em zêdetir li ser rûmetê kar dikin û piraniya berhemên me li ser şehîdan û mirovên bi nav û deng yê diroka Kurdistanê in, hin caran jî em ji delaliya xwezayê mifah distînin û ji xwezayê, nîgaran dikişînin.”

**Seh û pesna te ji nîgarkêşanê çî ye?**

Barzan: “Divê ez bibêjim ku nîgarkêşan nîşandan û eyankirina wêneyeke xeyalî ji

rastî û heqîqetan e û di rastî de rêyek e ku nîgarkêş bi alîkariya seh û îhsasên xwe yê hundir, di şeklê reng li ser kewal û tabloyan dikişîne û di rastî de nîgarkêşan pîrek di navbera rastî û xeyalên reng reng û delal de ye”.

**Çima berhemên we zêdetir wêneyên şehîdan in?**

Rêjav: “Wêneyên şehîdan bo me pir girîng û biqîmet in, şehîd miroveke qedirbilind û hertim nemir e û di rastî de kesek e ku bîngeha hemû delalî û xweşikiyan e û ew kesek e ku jiyan û canê xwe kiriye bihaya rêya xwe, lewra kêşandina wêneyên şehîdan ne tenê ji bo me xweşik e, belkî cihê şanazî û serbilindiyê ye”.



Hunermendên nîgarkêş ji çepê bo rastê: Şilan, Barzan û Rêjav

**Di dawiyê de we çî peyamek ji bo xwendevanên Agirî re heye?**

Şilan dibêje: “Ez hêviya serkeftinê ji bo we hemû rêzdarên dikim û hêvidar im ku Agirî giringiyê bide beşa çand û huner û di vî warî de zêdetir cehdê bike.”

Ji bo bersivdana Xaçpîrsa hejmaran (Sudoku)ye ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:

1. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.
2. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.

Bersiva Sudoku a Hejmara 45'an

4	8	5	2	6	1	3	9	7
7	3	1	9	4	5	8	6	2
6	9	2	7	8	3	4	5	1
5	6	8	4	3	7	2	1	9
2	7	4	8	1	9	6	3	5
9	1	3	5	2	6	7	8	4
8	4	9	6	5	2	1	7	3
3	5	6	1	7	4	9	2	8
1	2	7	3	9	8	5	4	6

Xaçpîrsa Hejmaran (Sudoku)

	3	1	2	9				6
4		6	1		5			
5	8			4		2	1	3
8	7		4			6		9
1		5		6	9	3		7
	6			7	2		8	
		7	6	8		1		
		4			7		6	2
6		8	3	2			9	4

## Pirsgirêka Şewatê Li Bajarenê Kurdistanê

**L**i tev bajarên Kurdistanê de pirsgirêka nebûn û kêmbûna Benzîne dom dîke û ajotkar divêt ji bo wergirtina 30-35 Litrên Benzîne di rojê de, çend demjimêran li rêza benzînxaneyê de rawestin. Her wiha ji bilî kêmbûna Benzîne pirsgirêka kêmbûna Gazol û Niftê jî serî hildaye. Hegerên sereke yê serhildanê û domkirina pîrsa han vedigere ser:

1- Şirket û aliyên ku şewatê ji xelkê re parve dikin, li rêyên cur bi cur de para şewatê ya welatiyan bi qazancê xwe li bazara azad de difiroşin û eva jî di halekê de ye ku rejim agehdarê wî karî ye. Lê bi diji wan tu gawekê na havêje.

2- Bi qaçaxîbirina Gazol û Benzîne jî bo rûyê dî yê sînoran. Kesên ku wî karî jî dikin yan karbidestên rejimê ne yan jî xelkê sivil in ku bi sedema nebûna kar û jî bo bîdestxistina debara jiyana xwe bi neçarî dest diavêjin qaçaxkirina şewatê û canê xwe dixin tirsê de.

3- Qasê şewatê ya ku ji aliyê hikûmetê



ve jî bo xelkê hatiye diyarîkirin bersiva hewcehiyên xelkê nade.

Rejim hegerke sereke ye li pirsgirêka şewatê li Şînoyê de.

Midehekê berî niha rejimê li bajarê Şînoyê de jî bo çareserîkirina pirsgirêka Benzîne û jî bo dayîna şewatê ji xwediyê Otombêlan re, 500 tûmen wergirtibû ku di vî rêyê de tenê Benzîne jî otombêlan bajarê Şînoyê re parve bike, lê heta niha jî kartên Benzîna wan nehatine dan.

## Vexwarina Çayê Gelek Bimifah E

Di encama lîkolînên Kingiz Kalica Londonê li Bîrîtanyayê de, vexwarina çayê gelek bi mifahrtir ji wê ye ku heya niha dihat çavniherî kirin. Ça pîşgiriye li hemberî uksîdebûna madeyên xwarinî di laşê mirovan de dîke.

Dr. Gîrî Rakiston dibêje ku çay heta jî ava vexwarinê jî bastir e û jî çêbûna nexweşiyên dil û zaf curên Penceşêrê pîşgiriye dîke. Hêjayî gotinê ye ku gelên Îranê di zêde vexwarina çayê di asta cihanê de, di rêza 5'emîn de ne.

Jêder: "Radio Farda"

## Yekem Esmangera Îranî



**Enûşe Ensarî,** Amerîkayî ya bi regez Îranî weke yekem jina gerîdeya esmanî di memûriyeteke esmanî ya Sefîneya

Rûsî de beşdariyê dîke. Ensarî yek ji sernîşînên Esmangera Soyuz TMA-9 ê ye ku qîrara 14'ê Septambera dahatî ji Qezaxistanê ve bo esman bihê şandin. Sefera wan dê 10 rojan dom bike.

Jêder: "Radio Farda"

## Nîgeraniya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî Ji Qaçaxa Mirovan

Li gor rapora nû ya komîteyê rêveber ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, qaçaxa mirovan bûye pîrsgirêkeke cihanî û di vî navberê de tu welateke pêşkevî yan di halê geşekirinê de li qaçaxê bi dîr nine.


Antiyoniyo Marya Kasta, berpîrsê birêveber ya îdareya xebatê dijî sûc û madeyên bêhişker di Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de got: "rast eva ye ku koletî di şekleke nû ya xwe yanî qaçaxa mirovan di sedsala 21'an de berdewam e û eva cihê şermê ye.

Li gor rapora vî îdareyê, di salê de bi milyon jin û zarok ji 127 welatên cihanê tenê qaçaxkirin û di dawiyê de jî di yek ji 137 welatên han û bi meremên weke mifahwergirtina nebaş ya zayendî û karên neçarî tenê bi kar anin.

Jêder: malpera "irwomen"

## Festîvala Helbesta Kurdî Li Kurdistanana Sûriyê

Her sal di 22'ê Çiriya Pêşin (Oktober)ê de, salvegera koçkirina helbestvanê navdar û mezin yê Kurd, nemir Cegerxwîn de,



Festîvala Helbesta Kurdî tê lidarxistin, lê mixabin di van du salên dawî de ev çalaki û xebat hatibû rawestandî.

Komîteya Rêveber ya Mihricana berê dixwaze îsal di van çalakiyan han li bajarê Qamişloyê li dema xwe de nû û zindî bike, lewra daxwazê li hemû nivîskar, rewşenbîr û helbestvanên Kurd dike ku xwe jî bo vî çalakiyê amade bikin û helbest û berhemên xwe heya berî destpêkirina festîvalê jî van re bişînin.


Herweha Komîteya Rêveber ya Festîvalê daxwazê ji hemû nivîskar, çalakvan û tevgera Kurd ya siyasî dîke ku piştgiriya xwe jî vî çalakiya wêjeyî di vî perçeyê Kurdistanê de bikin.

Berhemên xwe jî bo van du navnişanên jêrin bişînin:

pirustem@scs-net.org  
simko1@maktoob.com

## Li Mehabadê Jin û Mêrek Mijûlê Tûşkirina Ciwanan Bi Nesaxiya Îdzê Ne

Jin û mêrek ku hevjinê hevdu ne, li rêya xapandina Ciwanên Mehabadê mijûlê tûşkirina wan in bi vîrûsa nexweşiya malvêranker a Îdzê. Jin û mêrê



han ciwanan tevî hin keçan ku vîrûsa navhatî li cendekê xwe de hene û piraniya wan xwendekar û niştociyê Urmîyê ne, dinasînin ku li rêya peywendiyên cînsî(seksê) tevî wan tûşî wê nexweşiyê bin.

Hêjayî gotinê ye ku rejimê siyaseteke hov û nemirovane jî bo tûşkirina ciwanên Kurd bi nexweşiya Îdzê, girtiye pêş û ew gumane heye ku jin û mêrên han jî kirêgirtiyên rejimê bin.